Hesen Îbrahîm

Kursîk

-1-

-Diyar e tu mirovekê gelek zanayî?

-Ez zêrevanê cenabê te me, her di xizmeta te de me.

-Erê rast e, lê tu gelek ji min zana û xwandevantir î, te şiyanên zanistî hene.

-Dibe, lê min bext nîne, min çu mirovên xwedan desthelat nînin.

-Çi ye? Te divê bibiye xwedan kursîk?

-Na, na, kursîk nehîviya min e, tinê ez bişêm şiyanên xwe bêxime di xizmeta miletî de.

-Rast e, te şiyan hene, lê tu korebî, tu li ser vê kursîkê rûnanî …!

-2-

-Tu dizanî xwedanê bêla û trompêlên han, herroj êvarî, demê karê wî bi dawî dihê, kursîka xwe li gel xwe dihîne malê?

-Ew çawa babo? Ma dê kursîka wî bireve?!

- Erê, bawer bike, bi şev li ser dinive!

-Te nezanî ji ber çi ye?

-Nexêr, lê keça wî digote keça min, babê min ditirse bi şev yek li ser kursîka wî rûne.

-3-

-Seyda, rast e cenabê te berpirsekê mezin û xwedan şiyan e, lê em hevalên şoreşê bûn. Me gelek caran nanê tirsî pêkve xwariye, gelek caran xwîna me têkel bûye û tu…

-Bibore, ew roj çûn, niho rojeka dî ye, niho cihekê dî ye!

-Tinê min divê, tu ji kerema xwe rastiyê bibêjî, çi li wê belênê hat, ewa te di gel me gotî?

-Wek min gotî, divê hûn bêhna xwe fireh bikin.

-Heta kengî? Em bawer nakin.

-Na, na, bawer bikin…ez careka dî bi her sê kursîkên xwe ve sûnd dixum, hewe ji bîr nekim.

Hemû li hêviya kursîka çarê man …